



Efrîn di bin dagîrkeriyê de (205):

Gundê "Xerza", revandin û girtin, ji nû ve tomarkirina malmewalan, topebarankirina gundina li Bakurê Heleb, geregoşî û dizîna werza (mûsima) simaqê



Di heman dema ku Erdoxan li ser "xwepexşiya" vegera penaberên Sûrî di'axive de, nûçeyên jîholêrakirina kaxetên nişteçîbûnê ji penaberan re bi sedemên pir biçûk û leşkergehên derxistina zorane ji wan re ji bajarên Turkiyê, revîna hinekan ji wan ji leşkergeha Wîlayeta Osmaniye û nevehesiya piraniya wan ji vegeerê bo herêmen bandorî û dagîrkeriya Turkiyê li Bakurê Sûriyê (yên bê aramî û hêminî) belav dibin.

Ev jî hin bînpêkirin û tewanên têvel in:

= G. "Xerza":

Bi Navça Cindirêsê ve girêdayî ye, ji aliyê Bakur Rojhilat ve bi /11/K.M ji navenda wê dûr e, ji dora /25/ malan pêkhatî ye, dora/300/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen tê de bûn, jê dora /15 malbat = 75 nişte/ tê de

man, ên din jî zorane koçber bûn, û dora /15 malbat = 100 nişte/ ji anîndeyan tê de hatin nişteçîkirin û hin din jî di hin konên li rex gund de.

Milîseyên "Firqit El'hemzat" gund desteser dikin, mala Hemwelatî "Kemal Heyder Osman" ji xwe re dikin biryargeheke leşkerî, û tiştmiştên malan ji xwarinvexwarin, firaxên baqirî, cerên gazê, alav û amûrên elektrîkê û hin tiştên din, û hemî kelûpelên dora deh malên dest danîne ser dizîn, û herweha jî Makînak Mersîdês û tirektorek çandiniyê yên "Kemal Heyder Osman", tirektora "Îsma'îl Heftker", tirektora "Mihemed Arêf Osman", du matorên duloqî yên "Heyder Xelîl Osman, Mihemed Arêf Osman", giropa zayenda elektrîkê (ampêran) a gund û guheztoka (tirans) torya elektrîkê ya giştî.

Û wan dest danîn ser dora /40/ hiktar erd, jê yên "Mihemed Evdî Axa, Adêl Osman, Luqman Ebdo kurê Osmên, Kemal Heyder Osman", û ser dora /5/ hezar darên zeytûnê yên hemwelatiyê koçberbûyî "Îsma'îl Heftker" ji reseniya /25/ darên zeytûnê - malmewalên gund; Û /70/darên wî jî qut kirin, bi ser de jî qutkirina darên îhracê li dor gund ji bo êzingirin û bazirganiyê; Li rex wê jî çêrandina bêwijdan ji keriyên dewêr di nav zeviyên zeytûna û erdên çandiniyê de.

Û bi perên ku serkêşên milîseyan ji werzên (mûsim) ên ku dest danîne ser, firotina tiştmiştên dizînê, baceyên ferzkirî li ser werzên hemwelatiyên ku li gund mane û vêrgiyên diravî kom kirine, wan ji xwe re li gund guvêşgeheke zeytûna ye nû ava kirin.

Û xelkê ku li gund mane jî rastî cûrbecûr bînpêkirinan hatin, ji revandin û girtinên bêşûcane, îşkencekirin, peresitandin û hin din.

= Revandin û girtinê bêşûcane:

- Li 20.6.2022an. Z, Milîseyên "Ehraz El'şerqiyê" Hemwelatî "Ehmed Ebid El'rehman Me'imo /30/ sal" ji xelkê Gundê "Me'imila" - Reco û li Taxa Zêdiyê - Bajarê Efrînê rûniştî, li dema vegera wî ji ciyê karê xwe Dîkana "Zehrit El'xelîc" a şîrîniyê li Taxa Mehmûdiyê girtin, û piştî ferzkirina du hezar dolar li ser, ew li 28.6.2022an.Z berdan; Divê bê zanîn ku ew berê jî du caran rastî revandin û girtinê hatibû.

- Li 8.6.2022an. Z, Hemwelatî "Se'îd Umer Bîlal (Belbeş) /35/ sal" ji xelkê Bajaroka "Ekbezmeşdanê", ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Reco" ve hate girtin, û herweha jî heman milîseyan li 28.6.2022an.Z ji heman bajarokê Hemwelatî "Mislim Mihemed Elo /26/ sal" bi tuhmata têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê girt, û ta niha herdu bêşûcane bendkirî ne.

- Li 29.6.2022an.Z, herdu hemwelatî "Seydo Reşîd /37/ sal, Mes'ûd Ezedîn /23/ sal" ji xelkê Gundê "Şadêrê" - Şêrewa, bi tuhmata têkeliyê bi R.X a berê re, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" ve hatin girtin, û ta niha ew bêşûcane bendkirî ne.

- Li 29.6.2022an.Z, herdu hemwelatî "Mistefa Zîbar kurê Mûrêd /65/ sal, Idrîs Mihemed Beko /45/ sal" ji xelkê G. "Me'imila", ji aliyê Milîseyên Asayêşa Reco ve, bi tuhmata hevpişkiya wan di payêtiya şevayî de li dema R.X a berê hatin girtin, û li roja din hatin berdan, piştî ferzkirina /150/ dolar sezayeke diravî li ser her yekî ji wan.

= Ji nû ve tomarkirina malmewalan:

Jerkî Turkiyê û milîseyên Sûrî yên bi ser ve Herêma Efrînê dagîr kirine, ew li ser perîşankirina xelkê wê, belawelakirina jêderên rizq û talankirina malmewalên wan kar dikin, bi taybetî jî bi riya destdanîna li ser zeviyên zeytûna û ferzkirina vêrgî û baceyan li ser werzan (mûsiman); Û ew di lêgerîna li behaneyan berdewam dikin, da ku malmewalên xelkê ne li wir ji dest nişteciyên resen ên ku ji ber wan ve bi rêve dibin bigrin.

Bi ser ku "encûmenên xwecihî yên navçeyên Şera, Bilbil, Reco û Mabeta" berê piraniya malmewalên çandiniyê li sala 2020an.Z dabû dorpeçkirin û tomarkirin, û rêdankên beşekî ji wan - ên ku milîseyan pê nebiriş - dabû sazkirin; Dîsa jî li vê dawiyê bi riya keyan û serkêşên milîseyan xelk agahdar kirin, da ku ji nû ve bi beşdarbûna keseyetî malmewal werin tomarkirin, keya jî li ser her belgeyekê dora /2000/P.S wek cefa werbigre, û encûmen jî li ser her /1/ donimê /2/P.T werbigre, da ku werza zeytûna ya bê û çarenûsa malmewalên ên ne li wir di bin nîrê zordariya serkêşên milîseyan de bimînin.

= Şewatên daristanan:

"Berevaniya Sivîl li Efrînê - El'dîfa'î El'medenî" tekez kir, ku tîpên (tîmên) wê li 23.6.2022an.Z agirek li îhraceke Gundê "Hechesna" - N.Cindirêsê vemirandin, û ziyan gihîşte dora /20/ daran; Û di wêneya bi nûçeyê re belavkirî, qutkirineke berê ji darine mezin re tê xuyakirin.

= Geregoşî û serberdayetî:

- Li 29.6.2022an.Z, "tîpa endezyariyê - firqit el'hendesê" bombeyeke teqîner di makîna "Dilzar Seydo - serokê Encûmena Xwecihî li Bilbilê" de hatibû çandin teqand, di siya rewşa serberdayetiya ewlehî de ya ku li herêmê serwerkirî.

- Li 30.6.2022an.Z, di nav endamine Milîseyên "Elcebhe El'şamiyê" de li Gundê "Kefircenê" pevçûnek derket û qurşîn hatin avêtin, bi sedema nelihevkerinê li ser bazirganiya sûtemeniyê, û di encamê de yek ji wan birîndar ket.

= Topebarankirina gundina - Bakurê Heleb:

Hêzên Artêşa Turkiyê û milîseyên bi ser ve, êrişên xwe li ser hin gund û bajarokên Herêma "El'şehba'î û Çiyayê Lêlûn" - Bakurê Heleb a ku Artêşa Sûriyê desteser dike û tijî koçberên Efrînê berdewam dike; Li 27.6.2022an.Z wê herdu gundên "Aqûbê" û "Soxanekê" armanc kir, û di encamê de ziyan gihîşte mal û dîkanekê di yê yekê de di gel peydakirina tirsê di nav xelkê de, û jixwe yê dudiyê jerkî herêm hatiye dagîrkirin li Avdara 2018an.Z ve ji nişteciyan xwe yê resen valakirî ye, ji ber ku li xêza rûbirûbûnê ye û berdewam rastî topebarankirina yekser tê; Û li 28.6.2022an.Z jî, Bajarê "Tilrif'etê" topebaran kir, û di encamê de ziyan gihîşte malekê û tirs kete nav sivîlan.

= Binpêkirinîne din:

- Li 17.6.2022an.Z, du çekdarên Milîseyên "Ehrrar El'şerqiyê" şerê xwe di Hemwelatî "Ebdo Mihemed Birîm /27/ sal" ji xelkê Gundê "Miskê Jêrin" - N.Cindirêsê dan, li dema hebûna wî di nav zeviyeke zeytûna li rex Gundê "Sindiyanekê" yê hevçîwar, û matora wî ya dutekerî jî jê sitandin.

- Endamin milîseyan û anîndeyên ji wan ve nêzîk berhemên simaqê û qoriq ji malmewalên hin gund û bajarokên herdu navçeyên "Şera" û "Bilbilê" bi rengê pêşwext û fere dizîn, bê ku yek ji nişteciyan resen wêribe li pêşiya wan bisekine yan giliyekî li wan veke.

- Milîseyên "Feyleq El'mecid" (yê gundên "Kêla, Zerka û Çobana" desteser dike) ji ajovan (şûfêran) û xwediyan aletan "tîrektoran, makînan" û yên bilî, giropin li ser Watsê çêkin, da ji bo cîbicîkirina karên ku tê xwestin -bê kirê- wan yekser agahdar bikin, û çaxa yek wek ew dixwazin neke, ew tê kêmrûmetkirin û sezakirin.

Biryara Navdewletî /2254/ li ser "hewcedariya peydakirina merc û heyamên lêhatî ji bo vegera aram û xwebexş ji koçber û penaberên hundirîn bo herêmên wan ên resen û ji nû ve çaksazkirina herêmên ziyangihîştî" tekez dike, û rê nade Rijîma Turkiyê ku li herêmên Kurdî yên dagîrkirî bi armanca guhertina demografî gundine nişteciyanê ava bike, û neji barkirina zorane ji penaberên Sûrî re ji Turkiyê bo wan gundina.

03.07.2022an

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn

Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Wêne:

- G. "Xerza" - Navça Cindirêsê.
- Şewata daristanekê li G. "Hechesna" - N.Cindirêsê, û qutkirineke berê ji darên wê re.
- Topebarankirina malina li G. "Aqûbê" - Ç. Lêlûn.